

17. gulanê

Cejna Norwêc a neteweyî

Roja 17. gulanê cejna neteweyî a welatê norwêc e. Roja 17. gulana 1814an Norwêc destûra xwe bidestxist û em vê bûyerê di vê rojê de pîrozdikin. Berî 1814an ew çarsed sal bûn Norwêc beşek bû ji Danmark. Wê demê şahê danmarkî serekê Norwêc bû û liser gelê norwêcî ferz bû ku ew li pey qanûnên Danmark biçin. Di sala 1814an de gelek tişt li Ewropa qewimîn û hêviya gelê norwêcî çêbû ku ew bibin xwediyê welatekî serbixwe ku xudanê qanûnên xwe bê.

Destûr li bajarokê Eidsvoll hate nivîsandin

Di sala 1814an de 112 mêr li Eidsvoll civiyan da ku destûra Norwêc binivîsin. Ew ji deverên cuda ên Norwêc hatibûn. Navê Riksforsamling (Encûmena neteweyî) li vê koma mêran hate kirin û wan di şeş heftiyan de destûr nivîsandin. Roja 17. gulanê nivîsandina destûrê qediya, û ew ji aliyê Şah Christian Frederik ve hate imzekirin, û ji ber vê yekê ye ji vê rojê re Cejna neteweyî a Norwêc tê gotin.



Navê vê tabloyê 1814 e û ew ji aliyê Oscar Wergeland ve hatiyê çêkirin. Jêder: Wikipedia

17. gulanê roja alê ye

Roja 17. gulanê ji şagirtên dibistanan û piraniya mezinan re pişû ye. Ew roja resmî ya alê ye, û ji ber vê hindê her avahiyeke resmî ku milkê dewletê yan şaredariyê ye, divê ala Norwêc di vê rojê de bilind bike. Gelek kesên pîrvat jî alê bilind dikin di 17. gulanê de. Ala norwêcî di sala

17. mai – kurmandji

1821an de hate çêkirin. Tê de rengê azadiyê hene: sor, sipî û şîn. Xaç jî nîşana xristyanîbûna (filehtî) Norwêc e.



Ala norwêcî, Foto: Vegard Ottervik på Pixabay



Koşka Şahê norwêcî. Foto: GK von Skodderheim Pixabay

Cilûbergên cejnê

Adet e ku mirov di roja neteweyî de xwe bi cilên xweyî herî bedew bixemilînin. Gelek kes jî cilûbergên neteweyî (bunad) yan cilên neteweyî ên din li xwe dikin.

Di roja 17. gulanê de gotin jî têne pêşkêşkirin û şahî têne lidarxistin li dibistanan, parkên giştî yan li navenda bajêr.

Meşa zarokan



*Meşa zarokan li Oslo li pêşiya koşkê. Tu dikarî xanedana şah liser balkonê bibînî?
Foto: Wikimedia, Morten Johnsen*



*Şînruss û sorruss
Foto: Dimitri Valberg,*

Ji 17. gulanê re roja zarokan jî tê gotin. Li seranserê welêt zarok tevî meşan dibin, alên welat libadikin, *hurra* diqîrin û stranan dibêjin. Komên mûzîkê marşan dijenin. Di vê rojê de gelek kes sirûda neteweyî «Ja, vi elsker» distrênin. Têksta sirûda neteweyî ji aliyê helbestvanê

binavûdeng Bjørnstjerne Bjørnson ve di sala 1859an de hate nivîsandin. Di sala 1863an de pismamê wî, Rikard Nordraak, awaza sirûdê nivîsî.

Pîrozkirina qedandina dibistana amadeyî (Russefeiringen)

Şagirtên liber qedandina dibistana amadeyî (russ) qedandina dibistanê pîrozdikin. Hin ji wan ev 13 sal in ku diçin dibistanê. Russ taximên cilan ên taybet li xwe dikin. Liser van taximên cilan gelek caran ew bi pênuşa tûş silavên xwe ji hev re dinivîsin. Di meha gulanê de Russ gelek şahiyên lidardixin. Gelek ji wan terembêl yan otobûsên wan hene û ew li dewrûberê bajêr digerin û dengê mûzîkê pir bilind dikin. Gelek jî henek û laqirdiyan bi mamosteyên xwe dikin û wan di roja 17 gulanê de serê sibehî zû şiyar dikin. Li gelek deveran russ meşên taybet lidardixin û direqisin, stranên dibêjin û skêçên pêkenîne pêşkêş dikin.

Xanedana şah

Navê şahê Norwêc Kong Harald e û navê şajina wî Sonja ye. Şah, şajin û neferên xanedanê yê mayî her roja 17. gulanê liser balkona koşkê radiwestin û silava meşa zarokên Osloyê vedigerînin.

Meşa zarokan di kolana sereke ya bajarê Oslo de ku navê wê Karl Johans gate ye, ber bi jor ve dimeşe û meş di ber koşkê re derbas dibe, û zarok hemû û mamostayên wan bi destên xwe ji xanedana şah re bilind dikin. Zêdeyî sed dibistanan beşdarî vê meşê dibin li Oslo.



Xanedana şah silava meşa zarokan li Osloyê divegerînin. Ji aliyê çepê ve: dotmîr Ingrid Alexandra, mîr Sverre Magnus, prînsêsa tacparêz Mette Marit, şazade Haakon, şajin Sonja og şah Harald